# Ji Zargotina Kurdî

mamik
lihevanînok
şabûnok
zûgotinok
gotinên pêşîyan

Amadekar:
Reşo Zîlan - Hüsamettin Aslan - Amet Tigris



Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê
1996

Institut Kurde de Paris

891.1 ZIL JIZ

Institut kurde de Paris

LIV.KL.2727
20/07/2017
911 ZIL JIZ

# Ji Zargotina Kurdî

mamik
lihevanînok
şabûnok
zûgotinok
gotinên pêşîyan

Institut kurde de Paris

**Amadekar:**
Reşo Zîlan
Husamedîn Aslan
Amed Tîgrîs

Sida
This Publication was finacialliy supported by thi Swedish International Development Cooperation Agency, (Sida).

**Navê pirtûkê:** Destanên Kurdî
© **Amadekar:** Reşo Zîlan, Husamedîn Aslan, Amed Tîgrîs
© **Wêne:** Mehmet Kolçak

**Komîteya birêvebir ya projeyê**: Salih İnce. Naile Aras, Hüsamettin Aslan, Harun Eliacik, Bilal Görgü.
**Birêvebirê projeyê**: Bilal Görgü .
**Redaksîyon**: Hüsamettin Aslan, Mûrad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Serdar Roşan, Amed Tigris, Reşo Zîlan.
**Komita referensê**: Mûrad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Serdar Roşan, Reşo Zîlan.
**Weşîner**: Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê.
**Hevkara projeyê li Tirkîyê**: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
Weşandina vê pirtûkê ji bal Sidayê hatîye fînansekirin.
**Çapxane**: Ekspres Grafik Baskı Sistemleri Matbaa ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. Yüzyıl Mah. Matbacılar Cad. No: 34 (Türk Petrol Arkası) Bağcılar, İstanbul.
Tel: 90 212 430 88 13 (pbx) Fax: 90 212 430 88 16
e-mail: info@expressgrafik.com

**Belavkirin:** ZEND Bilim Kültür Eğitim Basın Yayın Tic. Ltd. Şti.
Namık Kemal Cad. Gençoğlu İş Merkezi No: 19/6 Aksaray – İstanbul.
Tel: (0212) 586 39 73-84 Fax: (0212) 586 39 90

**Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê**
Box 12097
102 23 Stockholm – Sweden
Tel: +46 8 650 62 68
**E-mail:** info@kurdisk-kultur.com
www.kurdisk-kultur.com

**ISBN:** 975-6282 -31-2

Institut kurde de Paris

# Ji Zargotina Kurdî

mamik / 5
lihevanînok /19
şabûnok /31
zûgotinok /39
gotinên pêşîyan /43

Institut kurde de Paris

# Mamik

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

1.
Apê min têt ji deştê,
Barek strî li piştê. <Jûjî, jijo>



2.
Teq teq dike, ne dar e,
Serî mişk e, ne mar e,
Gîya diwxe, ne kar e. <Kûsî, kîso, kîsel>



Institut kurde de Paris

3.
Kidî kidî mistan e,
Çil dergûş li destan e,
Ne ber e, ne bistan e.
<Mirîşk û çêlikên wê>



4.
Hel helo,
Simbêl belo,
Sim simî,
Dîwar kimî. <Mişk>



5.
Helê melê,
Padşa rabû serê kelê,
Rih heye, simêl belê. <Pişîk, pisîk, pisik, kitik>



6.
Reş e, reş e, mîna qîr,
Spî ye, spî ye, mîna şîr,
Diçe, diçe, mîna mîr.
<Qijika belek>



7.
Şaşik li ser sera ye,
Bang dide, ne mela ye. <Dîk, dîkil>




8.
Ser gilgil e,
Bin gilgil e,
Çav zîq û simbêl bel e.
<Kerguh, kêrwîşk, kêroşk>



Institut kurde de Paris

9.
Hêlîna şimşedarî,
Ne li berrojê, ne li nizarî. <Masî>



10.
Reş e mîna qîr,
Difire mina tîr,
Kutilkan çêdike mîna dêya mîr. <Kêzik>



11.
Çavzero, simbêlbelo,
Li ser dîwarê hembero.
<Kund>



12.
Dixwîne, ne mela ye,
Ne aşiq e, ne jî gewende ye,
Dijminê qewmê xwe ye.
<Kew>



Institut kurde de Paris

* * *



13.
Kap avê vedixwe,
Golik diwerime. <Zebeş, şitî, şûtî, şiftî>



14.
Hindik hindik,
Hindika hezar dendik. <Hinar>

Institut kurde de Paris



15.
Kumê hûtik,
Tijî nûtik. <Hêjîr>



16.
Gayê zexel,
Li pêşîya malan mexel. <Kundir, kulind, kulindir>

17.
Heft tas di hundirê tasekê de.
<Pîvaz>



18.
Me çandî wekî nokan,
Şîn bûn wekî sêvelokan,
Pê ve hatin wekî gûzelokan.
<Pembû>



Institut kurde de Paris

* * *

19.
Şevê bûk e,
Rojê pepûk e. <Çira, lambe>




20.
Kofîya Xezalê,
Hol bû newalê. <Heyv, hîv>



21.
Dersoka mermerî,
Tijî sêvêd heyderî. <Asman û stêrk>



22.
Mêrgeşîn, mêrgeşîn,
Du siwar tê de xuşîn,
Yek hesp e, yek mahîn. <Heyv û roj>




Institut kurde de Paris

*****

23.
Apê min ê bi lingekî,
Çû ber garana gundekî. <Mîrkut, mêkut>



24.
Sindirûk li ser sindirûkê,
Kilît û mifte di destê bûkê.
<Destar>



25.



Têt mîna bayê,
Serê wê mîna gayê,
Boça wê mîna seyê. <Balafir>

26.



Tiştek heye tiştanî,
Ne pê heye, ne panî,
Her roj diçe ber kanî. <Kûz, cêr, cer>

Institut kurde de Paris

27.



Got xişt xişt,
Çû li pişt derî rûnişt.

<Gêzî, gêzik, sivnik, sizik, qarûşe, havlêk, avlêk, kinoşe, şirt, melkes, cerîfk, cibrok, bermalk >

28.



Hil hilintir hilintir,
Kur ji bavê bilindtir. <Agir û dû>

29.
Şip şip dibê şil dike,
Erdê jî tim qul dike. <Dilop>



30.
Mehîna boz,
Li meydanê kire toz. <Aş>



Institut kurde de Paris

31.
Çîz û vîz,
Çû bajarê 'Evdilezîz,
Hat wekî qîz. <Name, mektûb>




32.
Qesra spî, bê pencere û bê derî,
Tê de rûniştîye bûkeke zerî. <Hêk>



33.
Hûr hûr barî, hey hey barî,
Deşt û banî, girt û danî. <Berf, befir>



34.
Sêsed û şêst û şeş reşêlek,
Diwazdeh ga û çar çêlek,
Nîvî reş, nîvî jî belek. <Sal, demsal û



35.
Mela ye, mela nîn e,
Aqildar e, ruh têde nîne. <Pirtûk>



36.
Dirêj e, spîndar e,
Di ser de rist e,
Di bin de mist e. <Teşî>




Institut kurde de Paris

37.
Bi qirik e, bê ziman e,
Bi dev e, bê diran e,
Dilorîne, lê ne însan e. <Bilûr>



38.
Bê dev e, bê diran e,
Bê kinc e, tev eyar e,
Li dawetan li dar e. <Dihol>



Institut kurde de Paris

39.
Ji şekir şirîntir e,
Ji hesin girantir e. <Xew>



* * * *



40.
Te nan dizî da kurikê kumsor,
Kurikê kumsor da rêza siwaran,
Rêza siwaran jî kir qulên dîwaran.
<Ziman, diran û qirik>




41.
Odeyeke şûştî mûştî,
Sîh û sê peya lê rûniştî. <Diran, didan>

Institut Kurde de Paris

42.
Dernakeve ji mal e,
Hem ciwan e, hem kal e,
Geh şûr e, geh mertal e,
Hem neyar e, hem heval e,
Geh şirîn e, geh tal e. <Ziman>





43.
Du pencereyên bêderî,
Bi şev girtî, bi roj vekirî. <Çav>



44.
Kanîya qinê qinê,
Mîr û hakim dest didinê. <Bêfil, bêvil, difn, kepû>



45.
Dîkek e, dîkvanek e,
Çar mî ne, beranek e. <Dest û tilî>



46.
Kanîya li nizarî,
Mîr û hakiman av jê vexwarî. <Memik>

Institut kurde de Paris

# Lihevanînok

Institut kurde de Paris

1.
Hêko mêko,
Çalim çêko,
Biskê Xemo,
Alê vingo,
Pê qulingo,
Ez kuncî,
Tu kuncî,
Ser kevirê narincî,
Ez firîm tu mayî li cî.

2.
Çîv im, çîv im,
Çîvtenok im,
Hêkan dikim,
Dişêlînim,
Heçkî birî,
Bav lê mirî.

3.
Hîvê hîvê,
Zengil zîvê,
Dêya min şorba şîr çêkirîye,
Para hîvê ji bîr kirîye.

Institut kurde de Paris

4.
Hingîn e, mingîn e,
Mirîşka min reşîn e,
Hêkên mirîşka min spî ne,
Mirîşka min di pûngala xwe de xwe ditelîne,
Kes nizane kê hêkên mirîşka min dizîne.
* (=pîng, koxika mirîşkan)

5.
Navê min, li navê te,
Kumê min, li serê te,
Bireve, ez bidim pey te.

6.
Êvar e, çiqas sar e,
Berf û baran dibare,
Ne cîh e û ne star e,
Kina min yeke rindik e,
Porê serî pirçik e,
Enîya wê jî kuçik e,
Çavê wê jî dendik e,
Sûretê wê textik e,
Guhê wê jî gupik e,
Pozê wê jî mêkut e,
Devê wê jî dîzik e,
Zimanê wê jî çoçik e,
Diranê wê şîşik e,
Kevçîyê wê jî darik e,
Kina min çawa rind e,
Mala wê li nava gund e,
Xortan li dorê girtîye govend e,

7.
Rovî, rovî, rindiko,
Serê dêlê kinciko,
Rovî çiqas fêlbaz e,
Ew mirîşkan dixwaze.

8.
Oso, Oso,
Kum koloso,
Gazî sê ke,
Sê derman ke,
Qantirê zîn ke,
Bişkulê bîhn ke,
Oso rabû ser darê,
Pix kire karê,
Kar melisî,
Os fetisî.

9.
Barî barî, berf barî,
Spî bû, nebû tarî,
Em bilîzin, heta dikarî.

10.
Bilo bilo bavê min,
Tiştek ketîye çavê min,
Xwelî be, bihele,
Darik be, bipeke,
Kevir be, biteqe.

Institut kurde de Paris

11.
Çol û çolistan,
Berrî û berristan,
Sê meh bihar,
Sê meh havîn,
Sê meh payîz çûn,
Ma sê meh zivistan.

12.
Hopanî, hopanî,
Kezîya min a panî,
Avêt gola hanî,
Gola han qamîş bû,
Kekê min çawîş bû,
Çawîşekî piçûk bû,
Jê re anî bûkek,
Bûka Hesen begê,
Sëva ser çelengê,
Çûme quleke tarî,
Teyrek tê de dinalî,
Min got: “Teyro çi ye?”
Got: “Tasa zengil e,
Avêt ber dil e,
Ez çûme Mûsil e”.

13.
Kevir û kuçên kendalan,
Gêr bûn hatin newalan,
Rovî bazda şekalan,
Got:”Xwelî li serê teralan!”

Institut kurde de Paris

14.
Kodê, kodê,
Zengil deve,
Mîr Mistefa,
Libke tirî,
Digindirî,
Du marên reş,
Du gulên geş,
Mîr Xatûnê,
Ez û tu xweş.

15.
Yek û yek,
Teyrikê belek,
Zaza bilbil,
Dermanê dil,
Şekir û şima,
Li ber çema,
Çem çikçikî,
Av tê nema.

16.
Hecî legleg, hecî legleg,
Mar hat, mar hat,
Marê reş ê sor hat,
Pîrejin bi qîjînî hat,
Kalemêr bi hesp hat.

Institut kurde de Paris

17.
Heklo meklo,
Çar im çeklo,
Hestîyê kewê,
Li ber kewê,
Kewka firî,
Mamê gurrî,
Di ser re firî.

18.
Xanima şirîn,
Porê zêrîn,
Li qesra jorîn,
Li nav pelîn,
Kesk û melîn,

19.
Ez im, ez im dîkê Misrê,
Dil ket mirîşka Fezîrê,
Nazan meke tu ji min re,
Bistînim bo te zîv û zêra.

20.
Nîskê,
Nokê,
Hebokê,
Miftoqê,
Lê çavbeloqê,

Institut kurde de Paris

Elîyê Memo,
Berda kumê,
Kum şehitî,
Mar behitî,
Sabûna reqê,
Devê melê,
Bila biteqê.

21.
Yek û dudu
Bawer sisê
Çeqlaw sisê
Mamo dîno
Kevirê şîno
Qesra Elî
Çardeh derî

22.
Cemik têye dikulike,
Berîka xwe tijî dendik e,
Du liban di destê min ke,
Nefsa min pir tenik e.

23.
Rojekê ji roja,
Wekî got pîrika,
Qaz ji qaza re,
Baz ji baza re,

Institut kurde de Paris

24.
Tişk im, mişk im,
Her roj dixwim,
Nanê hişk im,
Ez van deran,
Pisîk li doran,
Cirîd diavêjin,
Li van deran.

25.
Silo, Silo,
Du nikulo,
Nikul jê bû,
Silo gêj bû.

26.
Apo, apo,
Qafpapo,
Apo çû,
Amojin hato,
Hêrs keto,
Erdê keto,
Erd derizî,
Amojin lerizî.

27.
Derî deklo,
Dengê çûkan,

Institut kurde de Paris

Li ser daran,
Olan dide,
Li van çîyan,
Wek zengilan,
Dide guhan.

28.
Çûko çûko were malê
Nan bixwe, av vexwe
Bifire here malê

29.
Pisê pisê
Nan garisê
Pis ket çalê
Pis fetisî
Fat reqisî

30.
Teyro teyro tilûrî,
Girara bavê hûrî,
Tiştek nekete wî hûrî,
Ji xilaf nanekî tenûrî,
Hecî hecî ya sitar,
Koda genim çil û çar,
Çû ber dara zeytûnê,
Bû reqreqa sabûnê,
Hecî bavê Temo ye,

Institut kurde de Paris

Temo avêt mezatê,
Temoyê birayê Fatê,
Keçik anîn civatê,
Keçik bîst û sisê ne,
Li ser kanîka avê ne,
Felek bû sîya darê,
Temo bû mêrê Sarê.

31.
Ez li ber misîn,
Tu li ber misîn,
Tu bûyî wek pisîka çavşîn.

Ez li ser bana,
Tu li ser bana,
Ji tirsa xwîn li te nema.

Ez li nav beyara,
Tu li nav beyara,
Min dît kareke xezala,
Min girt û tu mayî vala.

Institut kurde de Paris

# Şabûnok

Institut kurde de Paris

1.

**Kurro Kurro**

Kurro, kurro, kurranî,
Kevir avît kewkanî,
Çavê kewê deranî,
J`xwe re kire mêranî.

2.

**Çêlek**

Çêleka bi golik,
Ketiye mêrga bi şolik,
Jan lê ketîye,
Êş lê ketîye,
Ka golik?

3.

**Paleyo**

Paleyo, paleyê dasê,
Dasa xwe biavêje cîhekî asê,
Were di ber qerefîla min de razê,
Ez ê tûrik hildim, herme parsê.

Institut kurde de Paris

4.

**Gevez**

Gevez dayika me şeşan,
Dendikê qawin, zebeşan,
Dermanê dilê nexweşan.

5.

**Destmala Te**

Destmala te gulgulî,
L`ser destê min fitilî,
Heyrana te wî dilî.

Destmala te belek e,
Ser milê min bû xelek e,
Dinya çerx û felek e.

Destmala te hêşîn e,
Min kişand bîhn bi bîhn e,
Min vekir, tiştek nîn e.

6.

**Çemo**

Çemo, çemo,
Çemê Payê,
Çem dikişe,
Deng jê nayê.

Institut kurde de Paris

7.

**Keçik**

Keçik çûne mendikê,
Dê qurbana rindikê.

8.

**Hîva Gundê Me**

Hîva gundê me, hîva sava,
Hîv xeyîdîye, naçe ava,
Dê û bavê min çi xort dîtin,
Hildan ji xwe re kirne zava

9.

**Vî Zinarî**

Vî zinarî şeqeşeq e,
Ez ê gulan biçinim,
Tu sosinan têke baq e,
Evîntîya min û te ser
Cotek gore, kitek saq e.

10.

**Dûvmeqesk**

Dûvmeqesk cînara me,
Wê hergav bê mala me,
Em çi bikin, çi nekin,
Jê re hêlînê çêkin,



Institut kurde de Paris

Wê bikeve baxçê me,
Wê bixwe çerezê me,
Û nahêle para me.

11.

**Berxvano**

Berxvano, berxan bîne,
Tu cîyê xweş biçêrîne,
Dayka te qurbana te,
To bide ser nanê te.

Berxvanê me delal e,
Desteka wî kara çal e,
Êvarê bîne mal e.

12.

**Me Zozanê Bilind Danî**

Me zozanên bilind danî,
Me ji kanîyan ava sar anî,
Em ê bixwin mastê tîr,
Em ê rûn hildin ji makîna şîr.

13.

**Silêmanê Dunikul**

Silêmanê dunikul,
Çû Şerûrê şuxul kir,

Institut kurde de Paris

Heta hat jinik lê mir,
Koloz danî, hawar kir.

14.
**Serê Sîpanê**

Serê Sîpanê Xelatê wê bi ter e,
Mîh dikale, li berxa xwe digere.

Serê Sîpanê wê bi gongil e,
Behra Wanê va li miqabil e,
Min hevala xwe dîye bi eşq û dil e.

15.
**Virde Diçim**

Virde diçim Leter e,
Ji wir de têm Leter e,
Çi gundekî bêter e,
Kûsî xistine defter e.

Virde diçim Marmûs e,
Ji wir de têm Marmûs e,
Çi gundekî bênamûs e,
Kûsî kirine helîse.

Institut kurde de Paris

16.

**Meşkê**

Dew, dewê çêla sor,
Meşk, meşka çêla sor,
Kêrî, lolebê bide jor,
Rûn bide dewrêşê kor.

Dew, dewê gamêşa,
Meşk, meşka gamêşa,
Kêrî, loleb tev hilkêşa,
Dew bikên, rûn bidne derwêşa.

Kil dewo, kil meşkê,
Kebanîyê pişthişkê,
Kêrî, loleb tev bişkê,
Kanê rûnê vê meşkê.

Dew, dewê mangan e,
Meşk, meşka mangan e,
Kêrî, loleb hildane,
Dew bikên, rûn bidne gundîyan e

Institut kurde de Paris

# Zûgotinok

Institut kurde de Paris

1.
Rûvî li rê livî, rê li rûvî livî.

2.
Şemo, Şemo, sê sêşeman, sê şo sabûn, şabaş daye.

3.
Şîv kundir, paşîv kundir, eza rindtir, naxwim kundir.

4.
Bivirê badayî, di qula darê de mayî.

5.
Pişk û mişkê di kolê de, min pişk xwar, mişk ma tê de.

6.
Kurm qurm qul kir.

7.
Heft teşt mist nîsk.

Institut kurde de Paris

8.

Şahînê şîvesorî, ez hatim şûna şûva Şahînê şîvesorî.

9.

Beran barrî di malê de, min beran xwar, beraz ma di malê de.

10.

Çêçik û kûçik di malê de, çêçik firîya, min çêçik xwar, kûçik firîya min çêçik xwar.

11.

Min tilîya xwe da qijikê, got: “qij”, qijikê berê xwe da min, min got: “qij”.

12.

Kerê boz di rizdê de zirîya.

13.

Çil çûrên çîqrût di nav avê de

14.

Rê li rê, rovî li rê.

Institut kurde de Paris

# Gotinên Pêşîyan

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

1.
Aqil taca zêrîn e, lê di serê her kesî de nîne.

2.
Bi xebera xweş, mirov ji qulê derdixe marê reş.

3.
Ji xelqê re masîgir e, ji xwe re kûsîgir e.

4.
Sêvên çê, para hirçê.

5.
Heftê û heft çîrokên hirçê hene, hemû jî li ser dara hirmê ne.

6.
Çêlek tim û tim nayên dotin, her gotin jî nayên gotin.

7.
Dinê li dinê, çavê gur li bizinê.

Institut kurde de Paris

8.
Gur hat waran, wey li halê jaran.

9.
Beza pisîkê, heta kadînê ye.

10.
Mirîşk û rovî, danaynin kirîvî.

11.
Şêr şêr e, çi jin e û çi mêr e.

12.
Kitik ne li mal e, navê mişk 'Evdirehman e.

13.
Bihar bi gulekê nahêt.

14.
Çi tê serê quling, ji qîrînîya quling e.

15.
Bi xwazîyan dest nagihêje baqê kezîyan.

16.
Pezê li paş mayî yan gur dixwe, yan jî diz dibe.

17
Rovî nediçû kunê, hejikek jî bi dûvê xwe ve girê da.

Institut kurde de Paris

18.
Şahidê rovî dûvê rovî ye.

19.
Her kes dîkê li ser sergoyê xwe ye.

20.
Qaz bi refa xwe re baz e.

21.
Bûk bi dilê zavê ye, çi kul bi dilê xelkê ye.

22.
Kûsî jî di gel xezalê ket bezê.

23.
Mala bêzarok wek dara bêfêkî ye.

24.
Bilind firî, nizim ket.

25.
Qedrê gulê çi dizane, kerbeş divê kerê reş.

26.
Çavê li derîyan, xwelî li serîyan.

27
Destê bi tenê, deng jê nayê.

Institut kurde de Paris

28.
Dar ku ket, herkes bivirê xwe lê diceribîne.

29.
Du parên xizaniyê nezanî ye.

30.
Eger ders e, herfek bes e.

31.
Gundê bêrez, konê bêpez, mirovê ku bibêje ez û ez, hemî jî ne tu tişt in.

32.
Kurmê darê ne ji darê be, dar narize.

33.
Tiştê çû, mede dû.

Institut kurde de Paris

This publication was financially supported by the Swedish International Develeopment Cooperation Agency.

Sida

Belavkirin:
Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

Institut kurde de Paris

Ev pirtûk bi alîkarîya SIDAyê (Swedish International Development Cooperation Agency), Dezgeha Swêdî ya ji bo Pêşdebirin û Hevkarîya Navneteweyî, ji alîyê Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê ve wek proje hatîye bi rêk xistin. Proje bi xwe wek zincîreyekê ji 28 pirtûkên kurdî pêk têt ku hin ji wan bi zaravayê kurmancî û hin jî bi zaravayê zazakî (kirdkî, dimilî) ne.
Ew pirtûk û herweha hemû pirtûkên vê projeyê ji alîyê Weqfa Kulturî ya Kurdî li Stockholmê û Enstîtuya Kurdî ya Stembolê ve bê pere tên belav kirin.

**Bi zimanê xwe biaxive, bixwîne û binivîse!**

ISBN: 975-6282-31-2

L
27